

## Tevkariyên dilxwaz

Dê û bav / çavdêrên hêja

Soza me heye ku her xwendekarekî/ê li NSW bighêje perwerdehiya gelemperî ya bi kalîte li dibistanên herêmî.

Di dema ku şîret û rêberî li dibistanên dewletê divê belaş were dayîn, em pir spasdar in ku hin malbat hildibijêrin ku bi dilxwazî alîkariya darayî bidin dibistana me.

Ji bilî vê tevkariyê, em dikarin ji dê û bavan bixwazin ku di seranserê salê de hin lêçûnên din jî beşdar bibin. Ev lêçûn li derveyî radestkirina xwendina bingehîn rûdinin û beşdarbûn ji bo malbatan vebijarkî ye. Ev dibe ku di nav de geşt an çalakiyên derveyî dibistanê bin. Heger yek ji van tiştan lêçûnên têkildar hebe dê ji we re were agahdar kirin.

Di dema ku em van tevkariyan pir teqdîr dikin, divê tu kes hest neke ku mecbûre ku beşdarbûna darayî bide dibistana giştî ya zarokê xwe.

Hun dikarin li ser lînka jêrîn tevkariyek dilxwaz bikin:

Eger hun ji ber tengasiyên darayî nikaribin van lêçûnan pêk bînin, dê ti zîrar neghên zarok/ zarokên we. Eger pêdiviya we bi alîkariyê ji dibistanê hebe, hun dikarin bi axaftina bi midûrê dibistana xwe re serî li piştevaniya veşartî bidin.

Heger hun bêtir agahdariyan bixwazin, ji kerema xwe dudilî nebin ku bi min re têkiliyê daynin.

Eger pêdiviya we bi alîkariya wergêrekî/ê hebe ku hun bi dibistanê re têkiliyê daynin, ji kerema xwe telîfonî 131 450 bikin. Ji opêrator re zimanê ku hun hewce ne û hejmara telîfona dibistanê bibêjin. Opêrator dê telîfonî dibistanê bike û wergêrekî li ser xetê bigire da ku di axaftina we de alîkariya we bike. Ev xizmet ji bo we belaş e.

Li gel rêzê

Midûr